

HOŞENG BROKA

SERBOREKÊN
ÇARŞEMBÊN TOZÊ

202

Institut kurde de Paris

Da ku rojavahiyên
derreh û sînoran
bi bêrikirinên

tozê

û Hicrikan

biniqutin

Institut kurde de Paris

Ji bo Arşivê

Pirtûkxaneyê

înstîtûta Parisê

ligel mistek jan

H. Broka

Institut kurde de Paris

SERBOREKÊN
ÇARŞEMBÊN TOZÊ

Institut Kurde de Paris

Institut kurde de Paris

LIV, KL 202
30/11/2017
922 BRO SER

HOŞENG BROKA

SERBOREKÊN

ÇARŞEMBÊN

TOZÊ

Helbest
1999



NAVÊ NIVÎSKAR:
Hoşeng Broka

NAVÊ PIRTÛKÊ:
Serborekên Çarşembên Tozê

Pirtûka Dugirê

KAWA FÖRLAG
Box: 3437
165 23 Hässelby-Sweden
Telfax: 46.(0)8 38 39 34

ÇAPXANE:
Apec
Box: 3318
163 03 Spånga-Sweden
Tel: 46(0)8 761 81 18
Fax: 46(0) 761 90 24

ÇAPA YEKEM 1999

© PIRTÛKA DUĞIRÊ

ISBN: 91 - 87266 - 52 - 0

WÊNEYÊN BERGÊ Û WÊNEYÊN HUNDIRÊ PIRTÛKÊ:
Reşîd Hiso

DERHÊNAN Û VERAXISTINA PIRTÛKÊ:
Kovara Dugirê

Diyarî

*Ji wê re
a ku ji xerîbo,
Ji hicrikan
û ji dehidana asoyan ber bi
şînahiya kesera wan ve,
hez dike.
Ji wê û Ji serserîtiya aliyan re.*

Hoşeng



Institut kurde de Paris

DEMA KU HICRIK LI MIN Û TE
DIGERIYAN



Hesso

Bêrikirin

Eger rojekê, hat û ji ser şopa te,
ez qetiyam,
wê çaxê, di bin şevê re,
ez dê şivîloka wê goristana, ku reş
di navbera min û te de,
jibîrkirî, bigirim,
û werim ba te.
Ez dê berê hemî in û çarşemban,
Ber bi te ve wergerînim.
Û dilê xwe,
yê ku bi keservedana te, hişîn
li ser mistika destê te, dê ji nû ve
gurî bikim.
Ez dê hemî ziyaretgeh û hicrikan,
li ber tiwafa pêkên te,
bicivînim,
û ez dê berbisk û keziyên te,
ji wan re,
daçikînim
al.
Da ku ez û tu, bişên
bi şahnazî
bejna êşê
bipîvin.

Serlêgeriya Bûka Mîra

Dûkelkêşên zivistanên te bûn
sersedên êşê;
ew êşa ku çar aliyên te, parvekirî,
kesera êvarîyan di rojavahiya
îskeîskên min de,
dinijinand.
Û tu dihatî...
Bawîşkên "Ararat",
sersotkên ku li "Cûdî" û "Hekarî",
di bendewariyê de, zîq,
hevpeyivînên dûmahîka şevê,
û her tiştî, nîşan dida,
ku tu dê nêzîk
bibarî.

Û tu her dihatî...
fûrandîna qehwa min, di serê sibehê de
qasida nêzîkbûna qedera te bû.
Wê sibekê,
ne wekî her carê,
te fîncana min, bi rê û şivîlekên
sermedî,
dagîr dikir.

Dema ku karwanê xwazgîniyan,
di tarîşevan de,
tiliyên xwe, ber bi te ve

dikirin:

"Bûka Mîra hat... Bûka Mîra hat"

wê gavê;

ew hicrika di pala gir de,

xewlegeha weşandina gunehên min û te bû.

Ji wan gunehan ve,

Min tu li ser tilîka xwe,

ya ku te bijartî,

pêçayî,

terîşeke kesk.

Ez û tu,

di pêşira yek hicirkê de,

hatibûn rakişandin.

Me gunehên xwe,

bi alên wê re

ber bi ba dikirin.

Di rojên şahî û erefatan de,

tiştên min û te,

li hev mikur dihatin,

û axika di guşê destmalka te de,

hişk girêdayî,

mîna mizgînokekê,

darêjî nav tiliyên min û te dibû.

Dema ku tarîk bi ser me de,

dadihat û em dadiqulpandin,

kêlikên geryanê,

bi vêxistina nalenalan re,

dest pê dikirin,

û destên min,
du dehlên ji xweliyê bûn,
li ser kêlekên te,
kolan bi kolan,
dinaliyan.
Di vê geryanê de,
ne çavên te, ji hilperikîna asoyan
diwestiyan,
û ne jî min dişêya,
te bispêrim
dîwarên jibîrkirinê.
Û tu her dihatî...
Dengê te,
ji paş oqyanosên taristanê,
ber bi kesera min ve
diherikî.
Û rojava,
dûkela asoyekî hingavî bû,
li şûn qedera te,
her dibawîşkiya.

Reşdahat,
civanê xelweta min û te bû.
Û rûkê te,
di hişyarbûna goristanan de,
heyveke vemirî bû,
ji ser astankên bendwariyê,
bangî serdanvanên êşa xwe
dikir.

Û aniha....
piştî çar welatan ji bendemayînê
tu dê tiliyên xwe,
ji bo bi darvekirina kîjan rengî,
yan serbitackirina kîjan
serokî,
bikî dargulîk?
De bêje bo min yarê:
Tu dê tidarkeke, ku hêjayî êşa me be
ji pizrûkên kîjan baranê,
ji xewna kîjan hicrikê,
û ji şêtbûna kîjan demsalê,
li dar bixînî?!
de bêje!

26. 05. 97 Bielefeld



Hesso

Genimê Eştarê

Çavên min
ji birîna asoyên te
westiyan.
Darhinar di bendewariya te de,
bi xewnên te
dipeqin.
Hîro, xwe ji hilpirikîna bayên
bejna te re
amade dikin.
Û tu...
her dimînî
baqeke ji genimê
neçinî,
di nav tiliyên "Eştarê"de
û li ser termê bêrkirinên min
tu lihevhatina payiz û buharan
li dar dixî.

Bendewariyek hişin

Her gav,
her ku roj di henasa
rojvahiyên de
dîfskiya,
derya...
di kesra te de
dibirsî
û keziyên xwe
di ber serê te de
dadiçikandin
du keskahiyên mişt
çavliirêmana
hicrikan.

07. 04. 98 Yonanistan

Institut Kurde de Paris

Institut kurde de Paris

**LIHEVMIKURHATINA TIXÛB Û
FERHENGAN**



Ferhenqa qiryanê

Dema ku çî welatan,
çî efsaneyan,
û ne jî çî salên batinî,
nedişêyan di ferhengên xwe de;
yên mişt kêfîkên dawî,
roj bûnên dawî,
û... destpêkên dawî,
navekî, ku hêjayî êşa te,
li dar bixînin,
wê çaxê,
ez rêvingekî mest bûm
bi germahiya birînên te
bi dükela êşên te,
bi revêna giriyê te
Ew giriyê, ku te hemî govend,
pê radigerandin,
û hemî naqos;
yên ku şîngiriya te,
bi helçinandîna elendê re,
di serê minareyan de,
dadiçikandin,
te pê dihewisandin,
û tu...
her digiriyayî!

Giriyê te,
di bîra min de

gilyê êvareke çarşembeyî bû,
li ber pêkên "Tawisan"
û "Stûna mirazan"
dengê "Def û şibaban"
diderizand.

Di serêvarên narîn de,
li ser banahiyên êşa xwe,
te tidarka zemînê/ destpêka hezkirinê,
û asîman
li ber şekirkê dilê xwe,
li dar dixist.

Giriyê te,
koçberiya heyveke li ber ava bû,
di şevbuhêrkên bajarên windabûnê de,
kinar bi kinar,
kesera te
vedida.

Ferhença demsalan

Tenê ev birînistan bûn;
pistepistên dawî, li ser lêvên wê rawestgehê;
yên ku di ber bi oxirkirina bîstikên tozê de,
bajar ji birînê hetanî birînê,
bi tembîknameyeke nîvco,
ber bi qerebalixa goristaneke
bêhicrik de,
serjêr dikirin.

Tenê ev welatên êşê bû;
yên ku di îstghên kelogirînê de,
rastî dûkela tirênên te dihatin,
Û bi dilekî ji agir,
çav li bendî libakirina destmaleka te,
ya melûlreng,
mîna xewneke hicrikane,
dikutkutandin.

Lê çav: çiçekên di rêvingiya traxûmê de,
weşiyayî,
rewangehên destpêkê;
destpêka bendewariyeke stewr,
dê çawan di serêvarên giryanê de,
bê noşandinekê ji qurmizîbûna lêvên te
yan lorandinekê ji şeva porê te,
bihewisin!?
Ew dê çawan, di lehiya hêsiran de, hillin,

û bişên di serhişkiya demsalan de,
xîveyên evîna te,
ya lêlanperest
bimizmizînin!?

Erê rêwiya min/
kurtepiştî çirayên buhurî,
di rêdûriya şevberatên berrikî de,
ma tu dizanî?
Zivistan, di navbera min û te de,
bûkek ji baranê bû;
me bi hev re,
kolan bi kolan,
ew li şûneşopa dilketîkê wê,
digerand.
Buhar, di bişkuvîna lêvên te de,
newrozêke rojane bû,
min welat ji giryanê hetanî giryanê,
pê dihedinand.
Havîn, va ye zû westiya.
Payîz, dê di hesreta te de,
bimiçiqe.
Û hîîîî ez aliyan ber bi te ve,
dişopînim
Rêwiya min.

11. 06. 97 Wien

Ferhengê aliyan

Birîna te.....,
sirûdeke qedaxe bû, di hişê tixûban de.
Li seranserî pistepista derrehê:
Ji dûrahiyên berfê hetanî dûrahiyên nalînê
dihate gurandin.
Karwanên helalokan,
di sergerdaniya bayên bertavê re,
her qasidên wê êşa te bûn;
ew êşa weke guleke berbiro,
ku di kêleka rojava de,
daçikandî.
Û zerdelperî,
di boxaza qirika te de,
gerdeniyek ji hêsirên
oxirê bû,
çîvanokên rêwbarîyan, bi fîşikên dawî,
li ser piştê siwarê rojava
dikirin mil.

Rojava,
di kenarên bajarên te de,
îskeîskeke rojane bû,
kolan bi kolan,
bi bendewariya şoqilan,
helbesta êşa te
dihonand.
Her tişt,

bi rengê te vedayî bû,
bi giriyê te dagirtî bû,
bi heskirina te,
ya koçerane
mest bû.

Hemî aliyên bêqubaliya mirazê te:
Ji pillindiriya birînên bakur
hetanî serserîtiya şefeqên başur,
û ji kelogiriya destpêkê/
destpêka vêketina êşê
û reşgirêdana "Çarçira"yê di xewna
rojhilat de,
hetanî birisînên "Xabûr" û daçikandina
"Xencera tebgawî" di kêleka
rojava de,
ji seranseriyê hetanî seranseriyê,
tu dihatî barandin,
baraneke nerm
giryaneke hêdî hêdî,
di serêvarên wê goristana
eşqê de.

Tixûb û tixûb,
bi kisîrekê ji giyaxwîn û derrehê,
li ber pêkên xwedawendekî
bêewle,
tu dihatî farûmar kirin.
Û cergê elendê/

elenda ku di gilîdana her hicrikekê,
û her ramîsaneke xwînî de,
bi dilê te vedipengizî,
bi êşa helbesta te
dihate guvaştin.

Birîna te...
dastanek ji poşmaniyê û yadîgariyên
çelmisî bû,
vedenga derizandinên min
dihincand.
Her ku roj dihate ber êvarê,
kuxandina te,
di sîka min de dialeha.
Û dilê min,
dibû demsalek ji baranê.
gav bi gav,
bi hesreta te
dibariya.

7. 97

Hess



Institut de Paris

Institut kurde de Paris

SEQAYÊN ZÛREZÛRÊ



Hesso

Xewaro û revêna aliyan

Ji wî re....

berî ku berbang lê mikur werin.

Rojzayîna te...

glliyê kêlîkeke felîte bû,

li ser rexerêkên poşmaniyê

û kinarên zivistanên êşê.

Ji wê birisîne ve,

a ku mîna welatekî gurandî,

li ber pêkên te

diferfitî,

tu bi rê ketî

tirêêêneke

heriffî,

û te alî li xwe kirin

çar bayên

êşê.

Ji wir...

derizandina dengê te

dest pê dikir,

û kendûkoz,

te di koçeriya belavbûna xwe de,

hişyar dikirin.

Û hino-hino tu dihatî vedan

asoyekî mest

bi gavên

baranê.

Ma haya te jê heye
Xewaro!?

Di berîkên te de,
welatekî jibîrkirî
nivistibû
efsaneyek
ji
kûrekûrê.

Û tu, careke bi tenê jî,
li şefeqên xwe;
yên melûl,
wek hatina te;
ku sal diwanzdeh mehan
xwe ji êşa te re amade dikirin,
mîkur nehafî.
Ma haya te jê heye
Xewaro!?

Hewes...
li rojhilatî te
serêlokek belqîfî bû,
seranserî tixûbên te;
yên pilînder
wek jana te
basimbar dikir.
Û tu,
her di serdana hişê xwe de
dimayî
xewneke qedexe.

Her ku roj li te digeriya,
û şopa ecacokan
te winda dikir,
aliyê din, yê xetê
ber bi te ve
diherikî.

Bendewariyên dara tûyê;
ya ku li raserî
wê hicrikê,
hînî harbûnên te
bûbû
di kesera te de
diçikiyan.

Demsalên hechecîkan, çarşembсор,
û bûkên baranê
hêdî- hêdî, li te dihatin hev
û teng dibûn.
Alîyan, xwe ji pevçûna te re
dirikrikandin
û li te teng dibûn.
Şev, hino hino li te sipî dibûn
û li te teng dibûn.

Wê çaxê,
tu bi qotiya tûtina xwe re
xelwe dibûyî
û ji wir/ ji tixûbên tûtinê
te tîfka xwe;
ya ku bi bêfikirina yara te
dadiwerivî,

ber bi demsaline nû,
alîne nû,
û şevine nû ve
vedikir.
Ma haya te jê heye
Xewaro!?

Di navbera te û yara te de
gavek ji beybûnê bû,
panav li dûv panavê,
tu li şopa kadizeke
ku te bihingivîne
êşa wê
digeriyayî.

Lê ne ew dibû "Leyl"
ne jî tu dibûyî
"Mecnûn"

Jî ser astankên çarşemban,
te xwe hînî berqebelkirina
layan dikir.

Dilê te, di mîsta te de,
heyveke li çardehê bû,

û berê te,
her ber bi wê ve bû.

Lêbelê te yê çî bikira
Xewaro!?

"Ne war ew war bû
ne jî buhar ew buhar bû"!!

Siegen 2.96.

Sînfoniya pîrpirîkên êgir

- ji Subhê re... ji Mehyar hetanî Nazik.

Tirbespî
di wê beyana xemlavêfî de,
sirûda kûrekûrê bû,
di zengelorka bê de,
gulxûnkeke tirsê bû,
Li ser kelaxê Elendê,
dûkelkêşên ku ji ber xwîngiraniya
zivistanên bêcir, nexweş,
û westiyayî
îskeîskên xwe;
yên fetisî
bi xîstexîştê pêkên zarokên
dîbistanê re
hêdî hêdî
diqulpandin
Û qehwe....
qehwa serê sibehê
bajar,
ji keskahiya dilê te,
hetanî keskahiya xewnên
hicrikan,
bi ser nalîna bejna xwe de
berdida,
helbesteke mest
bi şînegiriyê

Çile. 96 Siegen

Vêketina sîtavê

*- ji welatekî nebariyayî re...,
birîna duh,
xewna sibî,
Sebrî*

Duh....

mizgîna xewnên dilopkîfî bû,
û tu... hîna xalxalokeke nenivistiyî,
li ber pencerokên
yaran.

Ma tu...

bejna sînoran,
ji derreha kîjan zivistanê re,
amade dike

Rûbaro?!

Rûbarê kisîrên

netevizî,

were!!

were û...

bi ser hev de

b i x u l x u l e.

Hêêêêêdî hêdî

welatan

bibêje.

Qerax bi qerax,

hêlekanên ku roj di rêya çûn û nehatinê de,

li wan geryayî,

bîrhatokêd keftedayî,

û...

maçîkirinên bê reng,
vehesîne.
Were!!!
Were bi lezgîni
bixumxume.
Ji xunava di serê memikan de
qutufî,
vehilçine.
Ji kevîkên pistepisteke
kewijî;
wensa nobegehan û têtên derrehî,
vepengize.
Û.. bizûre..
bibeşire.
Xwe ji bêcîriya kêlîkên mişt
bi kemînan,
ku her roj,
bîst û çar kathejmêr,
bi mirina te şa dibin,
vedize.
Û... nerme-nerme bibare:
ez
siya
şehîdekî
nenas im..!

Gilî

te pişta çend welatan
ji girî
da "Felekê"
û çend û çend hezar demsalan
ji bendewariyê
da oxirê
lê tu carek nebû rêwing
yarê...!?!?

Institut kurde de Paris

Nexşeya Çarşeman

Mirî serdanvanên zindiyên bûn
û tu li ser gerdana rojava
hatibûyî honandin,
cejnek ji êgir u baranê.
Dema ku te
êş li dûv êşê,
hînî vêketina endekofê dikirin,
goristan li te
hişyar dibûn
û qefil bi qefil,
dihêrikîn ber pêkên gunehkariya te,
ya mezin u xweşik,
bi zelûfî
tewaf dibûn.
Ew dixîşiqîn ber pencereya te;
ya mişt vegirtina bexûrê
û çarçav li jana te;
ya mina şkevayekî,
ku te ji pêşabûna elendên keskane re
amade kiribû
seyr diman.

Ew bûn,
ew zehmanên kesk fereh
wek dilê te,
yê ku li seranserî eşqa te,
dihatîn vedan.


Ew bûn;
ew miriyên ku bi heskirina te nexweş
yên ku li şûna birçiyar
di bendewariyê de,
hişyar diman.
Û weha ..
her ku dilên wan
bi bêrîkirina cejn û erefatan,
lê bixiste,
tu li ser milên wan dibûyî
istanek ji çarşeman .

Çile. 98

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

YAR, PIŞTÎ GAVEKÊ JI ENDEKOFÊ



Li pêxên istanîne nehedînî

I

Di destpêkên te de
destpêkên

xwînî

cih...

di tenhatiya xwe de
qefîtkiriye,
û dem....
li çardaran,
ber bi dawiyê ve
dibeze.

II

Evîna te...

buhareke bedrengê
di lêvên şetavan de
bêfîkoke nûgihayî ye
ji serguhên bendewariyêke serhişk
dinquete.

III

Du gêlasokêd mizin
lêvên te,
di serê wan de,
bêfîkirin
dibirise
û kul dibin
hemî

h
e
l
b
e
s
t?!?

IV

Pîrozîrîn agir

Ew in....

ew

helbestên di serê lêvên te de,

ku

hîn

nehatine

vêxistin.

V

Bêdengiya te

heyveke şermoke,

li paş bihvçûnên karwanan,

tena-tena,

bi dilzî,

diçe


ava.

Bielefeld. payiz. 96

Çavên te!

Du nêrgizokên qedaxe ne,
çavên te.
Di şêlûbêliya aliyan de,
Li xwazgîniyen êşa xwe
Digerin.

Institut kurde de Paris



Hess

19

1950

Sirûda westandinê

Êvar.... ger birîndar bibe
ne xeme...
çimkî di êvara gonê de,
welatek ji zivistanên birûskvedayî
bi birînan,
li ser agirên lêvên te,
hêlîn dibû.
Şev ger li tirênan
bigere,
û rojava, di sefera malanên memikên te de
raweste...

.....

.....

Wê gavê, tu dê bizanibî, ku
çendî ji te hez dikim
hetanî westandinê!!!
hetanî....

Tobedari

Di şeva gonê de...
ez micêwirekî serxweş bûm,
li ber çiradankên tiwafgeha te,
min tobe dikir.

Di şeva gonê de,
ez bendwariyek ji minminîkan bûm,
ji nav mijankên te,
diwşiyam.

Di şeva gonê de...
ez çemekî ji axîn û xwêhdanê bûm,
keser bi keser,
ji velerizîna cotkê memikên te,
dixulxulîm.

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

**BAŞÛR, JI ÊLINCZAYÎNÊ HETANÎ
WESTANDINA TIRÊNAN**



Hessa

Institut kur... Paris

Başûrkirina êşê

ji kulîlkên êşê re...

I

Ji sema û nimêjan ve;
semayên agir,
nimêjên baranê,
ez libedemayina te
diqurçînim.
Pistepista di bin têlên derrehî re
Xweşêlandî,
di şefeqên te, yên hênijok de
vedigrim.
De sêrke dîna min,
şev vaye bi xew ve çû.
Derya....
ji kesera te,
tev di bîna min de
çikiyan,
li her aliyekî te jî
BAŞÛREK

diferfite,

lê.....tu

nayê?!!!

II

Hemî welatan,
di payizên lêvên te de,
dil weşandin,

tenê min,
bi şêlûbêliya başûrê te re,
gerdûn
çardemsa
lorand;

Institut kurde de Paris

Tidarka renqan

*ji agirê zîlan
û... mezlûman re.*

Ji ber ku Newroz

hîna dîlanek,

tenê

ji sor

û zer e...

ez dê hemî rengên dinî

nedîlankirî,

di kenê agirên birêketî de,

yên ku bi heyfa avdarokên duh re

tên,

bixeyidînim

welato.....!!?

Êvarek ji erxewan û lilakê

Bişirîn....

bişirîn vê êvarê,

serxweşbûna heyveke çavliêmayî ye

li ser lêvên te.

Û zemîn...

zemîna ku bi giriyê te vêkêfî,

ji nû ve dipişkuve

erxewanakî mest bi beyanên baranê.

Dem erxewan e.

Êvar erxewan e.

Ken erxewan e.

Her bişkuvînek bi welatekî dildayî

avis e,

lê temîk....

temîkên kawik

ji te navebin,

bi her xilmaşiyekê re,

amade ne ku sîka te

kul bikin.

Û lîlak....

bi noşandina kenê te re,

her dimîne sergovendê

vê êvarê

her mişt dibe

bi henasên

te, dildarê.

Oldenburg 11.96

Xatirxwestin

Duh...

bi esra bilind re,

sîka te,

sirûdeke bêhal bû,

di nav mijankên babexîlkan de.

Hîna ji dû.....û....r

li bîna gavên te

hişyar dibûm.

Tu dextl û dextl dîskiyayî,

û babezkê,

tu dihatî bi payîzek girî,

li ber min dixist

û

d i b u h u r î.

Her ku tu ji xwe dûr diçûyî:

- pişta te li oxirê, berê te li rojavahiya

demsalan-

Ez di kulbûna lêvên te de,

dihatim vemirandin,

û xatirxwestin...


li şûn te

kuştargehek

ji

xecxecokan bû.

Berlin. Nisan. 95



Hessa

Institut Kur...

Tabloya berdawiyê

Şev...

di bawîşkandina nîvê xwe
yê dawî de bû.

Tirên...

di navbera du aşiqan de
dîfskiya.

Çav bi kila oxirê
diweşiyên.

Û tu...

di bendemanê de,
destmalkek
bi tenha bûyî.

Çavên te li dûkelê bûn,
yên min,

her bi te şa dibûn.

Hêdî- hêdî,

di kesera te de
diçikiyam.

Û xewnên xwe,

yên dawî,

li ser lêvên

te,

min

n î g a r

d i k i r i n.

Rêya bablîsokan

Her ku bayê te
li min radibî
û bablîsok min û te
ji hev û din
didzin,
tu dihilperikî ser milên spêdekan
û.....ez dibim "Xefûrekî rêya"
li şûn barana
dilê te.

11. 98 Bilêfeld

Institut kurde de Paris

Efsaneyê derrehê


Dema ku te ez û bajar
sipartin xewna xetê û hehecîkan,
tu keskahiyek ji hicrik
û goristanan bûyî .
Di navbera herçar êşan de,
te tiliyên min
hînî bixêrhatina darbestên ji baranê,
dikirin;
darbestên mişt serpêhatiyên barûd, tûtîn,
û şevên derrehê;
darbestên hişîn
wek bêrîkirina herdu aliyên xetê
ji aşiqên mayinan
û birîndarên nefelê re;
darbestên melûl
wek sêşevka sînoran.

Te çavên min û bajêr
Hînî çavdaştina
beriyên dûr,
qewimînên dûr,
tixûbên dûr,
û şefeqên dûr
dikirin.
Di wê navbera
ku bi çar kêran
sînorkirî,

min bi destê te û bajêr
digirt
û efsaneyê derbasbûnê;
derbasbûna sext
û dijwar,
min bi xîştexîştê pêkên te re
şa dikir.
Çav,
serhildanek ji çivîkên
dîlbijandinê bûn,
di ser dîwarên derrehane
û keldûmana çixareyên pasvanan re,
dihingivîn ecacokên sermedê;
yên li aliyê din
ê xetê.
Û tiliyên we,
di nav barana destên min de,
bi jena bênikirinê
û sipêdekên
hîroyê
diwerivîn.

Institut kurde de Paris

LI SER ŞÊMIKÊN BARANÊ



Institut für die deutsche Sprache

HESO

Bendewariyên spêdeke tevîzî

Wê sibekê...

hîna zû,

bi helçinandina gwêzikên pembo re,

te ahînokêd xwe;

yên lal,

sozên li ber bayê,

paytextên engirî,

li ser textikên ku bi talanan

xwedîkirî,

yeko o o o.. yeko

dipelixandin,

û... dilketîkê te

nehat.(!)

Bêrîkirinên tozê,

ji zivistanên êşê re,

li ber pêkên zaroktiyek ji tozê,

ji boyî tozê,

te kiritand

û..dilketîkê te

nehat.(?)

Hemî awazan

bi viyana te

xwe kuştin,

xilmaşiya rojvayekî kêrdayî,

di kefenê tixûban de,

te

h

e
d
i
n
a
n

d û...dilkefîkê te

nehat

û nehat

û nehat!!!?

Amsterdam 10.11.95

Institut kurde de Paris

Talankirina aliyan

Bi ku deverê de diherikim
tiştên te,
te saloxî min
didin.
Her ku ez dibim rêwing,
tu li min radibê
bayekî
nerm
ji
hemî
aliyan.

Institut kurde de Paris



Hesso

Institut Kurde de Paris

Evînbazî

Dema ku
tu têt, û bi hatina xwe re
tu bêdengiyê birîndar dike,
ji te hez dikim.

Dema ku
bişîrîna te, di berbanga odeya min de
dihile,
û pencereya min
hînî aliyanê dike,
ji te hez dikim.

Dema ku
tu memikên xwe;
yên gihayî,
mîna du êşan,
di barana tilîkên min de
hêlîn dike,
û tu, babezkê
li seranserî cejn û sersalên min
tê honan
Basimbarek
ji
sermadê,
ji te
hez dikim.

Basimbara 98 an. Bielefeld



Serdan

Sahiyekî çîk bû...
bi ser bejna keserê de
hatibû xwar....
Ne heyv
di veşara giriyê xwe de
çûbû civan,
û ne jî pasvan
ji vegirtina welatan,
di keldûmana çixara xweyî
huşkirî de,

w

e

s

t

i

y

a

bû.

Wê gavê,
hîna stêrkan dest bi hejmartina
xewnên te
nekiribûn,
ez hîro û hîro
di henasa te de
şîn dilhatim

n

a

a
a
l
î
n
e

k li pêxên dûriyê.

Hemî ax û ofên te;
serdangehên kêlikên

qedaxe,

min

miz

miz

an

din

û te negot na...

yarê!!!?

Institut Kurde de Paris

Xewn

Di gerdena pir bandevan de
min "Welat çiqqa xweş û rinde"
miminand
ristikek morîk.

Bi gelek çiyayên bilind re
mîna bayê "Qamişlokê"
min bê qeder agir
vêxistin.

Û... li ser gewedê gelek helbestan
bi qasî ewrên stewr
min tirê..êêên
wêne kirin.

Belê tenê yek şevê
bi xewnê re
bûm yar:


Dema ku min êşên
xangozel,

qinêber,

û...şimamokan

gurz bi gurz
ji ser lêvên te
diçinîn,

.....tê bîra te??!!!!



(...)

Li wir...

li bakurê êşê,

dema ku baranê,

tu destnîşanî min dikirî,

sînfoniya rengan dilerizî,

mîna kilîloyekî ji berfê.

Xewnên "Felekê" di hişyarbûna

"Xerîbokî" nedilmayî de,

dibariyan.

Ew nermeyaran/

stirana li paş bêdengiyê,

sergovenda her xaçkirinekê bû,

xaçkirineke, ku hîn bi rê ve têt.

Îske-îska her ximavekê,

û her qozeqereke têrnegirayî bû.

û...

Ev dil,

yê ku mîna stêrkeke vemirî,

li ser devê birîna te,

diweşiya,

bi hicrikên çend "Anahîta" re

kelooooogirî bûwiye,

û "Zergwîz",

hîn

dipeqe!!!!

Zayîn

Ji êşê
tenê ez hînî xiştexiştê tixûban
li pêxên êvariyên te,
bûbûm.
Û her ku şev
bi tenhatiya min û te
vê diket,
bi kesera xwe,
min nalenala te
dikola,
û li ber govenda azariyên te
min tidarka welatekî
mişt ji tozê
mişt ji berfê
mişt ji rojava
û ji...
li dar dixist
te nav
lê
dikir (.....)

28.ê Adarê.98

Institut kurde de Paris

NAVEROK

Diyarî..... 7

DEMA KU HICRIK LI MIN Û TE DIGERIYAN

9

Bêrîkirin	11
Serlêgeriya Bûka Mîra	12
Genimê Eştarê.....	17
Bendewariyek hişîn.....	18

LIHEVMIKURHATINA TIXÛB Û FERHENGAN

19

Ferhenga giryanê.....	21
Ferhenga demsalan.....	23
Ferhenga aliyan.....	25

SEQAYÊN ZÛREZÛRÊ

29

Xewaro û revêna aliyan.....	31
Sînfonya pîrpirîkên êgir	35
Vêketina sîtavê.....	36
Gilf	38
Nexşeya Çarşeman.....	39

YAR, PIŞTÎ GAVEKÊ JI ENDEKOFÊ

41

Li pêxên istanîne nehedinî.....	43
Çavên te!.....	45
Sirûda westandinê	47
Tobedarî.....	48

BAŞÛR, JI ÊLINCZAYÎNÊ HETANÎ WESTANDINA TIRÊNAN

49

Başûrkirina êşê.....	51
Tidarka rengan	53
Êvarek ji erxewan û lîlakê	54
Xatirxwestin.....	55
Tabloya berdawiyê.....	57
Rêya bablîsokan.....	58
Efsaneya derrehê	59

LI SER ŞÊMIKÊN BARANÊ

61

Bendewariyên spêdeke tevîzî.....	63
Talankirina aliyan	65
Evînbazî.....	67
Serdan.....	69
Xewn	71
(...).....	73
Zayîn	74
Naverok	75

Institut kurde de Paris

Hoşeng Broka:

Di sala 1969 an de li gundê Tilxatûnkê ji dayik bû.

Di sala 1994 an de ji zanîngeha Şamê diploma sosyologiyê wergirt.


Ji dawiya sala 1994 an û vir de li Elmanyayê dijî.

Berhemên wî:

- Bawîşkandinin ji kopên minareyin razayî (Helbest 1995).
- Lêkolînin di mîtolojiya êzîdîtiyê de (bi zimanê erebî).

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris



Di govenda serbitackirina peyvên dirinde û bejî de, eger ziman li dîroka xwe mikur bêt û li kavilên giyanê xwe vegere, dê pêrgî govendgerên bêwestan û cegerdar ên derbirîna şahiyên ji êgir bibe.

Di xelwetgiriya peyvê de û di pêjnên kevirane yên sermestîya helbestê de, hest zingezinga xwe vedixwin û xewn jî dastanên xwe ji rivîne diafirînin.

Lê di dawîya her govendê de, hehecîkek an jî pinpinîkek dimire, toza serboran di çolistanê hişê me de tîrtir dibe û peyv, wek zixteke bêagah, bi bahaneya spehîkirina xewnê, dihingive jena dilê me.

Carşembên tozê jî da ku bêhûdeyiya govendên aliyan bixemilînin, ber bi destên xatirxwestinê ve diherikin û sîberên dijwar ên peyvê li ser dijwariya lîlandinên bêhîkirina bêrîvanan, radiperînin.

Ehmedê Huseynî



THE STORIES OF THE DUSTY WEDNESDAYS
BY HOSHANG BROKA

ISBN: 91-87266-52-0

LIV.